4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

4. O, məktub göndərdi. O məktublar göndərdi.

T. R. Fatiyeva, K. R. Mustafayeva

Gavek berbi ZIMANÊ KURDÎ

KÜRD DİLİNƏ doğru bir addım

Bakı - 2020

Gavek berbi Zimanê Kurdî KURD dilinə doğru bir addım

feilləri keçmiş

sadə zamanda açın.

Şilanê ez (dîtin) dîtin. Şilanê

ewana (dîtin) dîtin.

Şilanê tu (dîtin) -----.

Şilanê hûn (dîtin)-----

Şilanê ew(dîtin) -----

Şilanê em(dîtin) -----

2. Pirsîn, stendin, şandin,

girtin, dayîn feillərini şəxsələr üzrə keçmiş sadə zamanda təsərif edin.

Min pirsî Min stend M i n

şand Min girt Min da

Te pirsî Te ... (E)wî...

8. Aşağıdakı təsiri feillərin

tamamliqla şəxsə və kəmiyyətə görə uzlaşmasına fikir verin və onları Azərbaycan dilinə tərcümə edin.

Min gilîk pirsî. Min namek şand. Te pirtûkek stend.

Min çend gilî pirsîn. M i n çend name şandin. T e

çend pirtûk stendin.

9. Hatin, ketin (təsirsiz), hildan, xwarin, dayîn (təsirli), feillərini keçmiş sadə

zamanda təsərif edin.

ŞƏRƏF XAN BİDLİSİNİN “ŞƏRƏFNAMƏ” ƏSƏRİ KÜRD XALQININ TARİXİ MƏNBƏYİ KİMİ

Əvvəli ötən sayımızda

«Şərəfnamə»dən istifadə edən Avropa müəlliflərinə gəldikdə, demək olar ki, XVII əsrdən başlayaraq, həmin əsər bir mənbə kimi onların nəzərini özünə cəlb etmişdir. Tədqiqat zamanı məlum oldu ki, 1632-1668-ci illərdə fransız səyyahı Jan Batist altı dəfə Orta və Yaxın Şərq ölkələrinə səfər etmişdir. O, həmin səfərlərində Kürdüstanı gəzmiş və Bidlis əmiri Əbdal xanla şəxsən görüşmüşdür.

Jan Batistin yazdığına görə o, Əbdal xana hədiyyələr vermiş və Əbdal xan da öz növbəsində ona öz hörmətini göstərmişdir (74, 382).

Jan Batist özünün «Səfərnəmə» əsərində «Şərəfnamə»də qeyd olunan bir hadisə haqqında belə yazır: «Van əyalətində varlı bir tacir balığı çox olan çayı paşadan icarəyə götürür... və ovçular hazırlayır. Lakin ov vaxtı hər nə tuturlarsa balıq yox, ilan olur. O, ildən sonra həmin çay bir daha icarəyə verilmir» (74, 382). Bidlisi bu haqda qeyd edir ki: «Yaz aylarında çayın suyu çoxaldığından balıq göldən çaya gəlirdi. Əhali istədiyi qədər balıq tuturdu. Mənim zamanımda dövlət məmurları həmin çayı icarəyə verirdilər. Təsədüfən o il balıq sudan kənara çıxmıdı... Beləliklə də, o çay daha icarəyə verilmədi» (76, 355-356)

Jan Batistin əsərində «Şərəfnamə» dəkilərə oxşar hadisələrə təsadüf etdiyimizə baxmayaraq, müəllif öz əsərinin heç bir yerində Bidlisinin əsərinin adını çəkmir. Fransız səyyahının Bidlis əmiri ilə görüşməsi və hər iki müəllifin əsərlərində balıq hadisəsinin eyni məzmununda verilməsi, V.Velyaminov-Zernovun yazdığına görə «Şərəfnamə»nin ən yaxşı əlyazmasının Fransada olması (76, 22) belə bir fikir doğura bilir ki, Jan Batist «Şərəfnamə»dən istifadə edən və onun əlyazmasını Fransaya aparən ilk avropalıdır. Ancaq XIX əsrin əvvəllərində Avropada D'Erbelo özünün «Tarix eş-Şərəf xan əl-Bidlisi» və «Tarixi əkrad» adlı məqaləsində «Şərəfnamə»dən geniş bəhs etmişdir. O, bu məqaləsini yazarkən, Katib Çələbinin bibliografik cədvəlindən istifadə edərək onun «Şərəfnamə» haqqındakı qeydinin bədii tərcüməsini vermişdir. Artıq bu dövrdən etibarən «Şərəfnamə»nin əlyazmalarının Avropada mövcud olması ayrıca kürd tarixi ilə məşğul olan şərqşünasların nəzər-diqqətini cəlb edirdi.

Məşhur ingilis şərqşünası Con Malkolm 1815-ci ildə özünün «İran tarixi» adlı əsərini nəşr etdirdi. O, həmin əsərində «Şərəfnamə»yə istinad edərək, kürdlərin iranlı olduqlarını irəli sürürdü (97, 8)

1826-cı ildə «Şərəfnamə»nin tərcümə edilməsi fikri rus şərqşünaslarının nəzər-diqqətini cəlb edirdi. Həmin ildə rus şərqşünası M.Volkov «Asiya» jurnalının 8-ci nömrəsində çap etdirdiyi məqaləsi ilə «Şərəfnamə» və onun müəllifi haqqında bir sıra məlumatlar verdi (133, 210).

V.Velyaminov-Zernov qeyd edir ki: «1826-cı ildən sonra «Şərəfnamə» Avropada öz elmi dəyərini tapdı. Elmə bu xidməti etmək şərəfinə isə Rusiya və rus alimləri nail oldular» (76, 14).

Bu zaman Peterburq Şərq Dilləri İnstitutunun professoru Ş.Fren «Şərəfnamə»ni tərcümə etmək fikrinə düşdü. Lakin onun səhhətinin pozulması belə bir işin icrasına mane oldu (76, 15).

1856-cı ildə Peterburqda Peter Lerxlin redaktorluğu ilə kürdlərin əcdadları haqqında bir tədqiqat əsəri hazırlandı. Həmin əsərin yazılmasında «Şərəfnamə»nin əlyazmasından tarixi bir mənbə kimi istifadə edilmişdir (20, 25).

Qeyd etmək lazımdır ki, «Şərəfnamə»nin pərakəndə əlyazmalarından tarixi bir mənbə kimi istifadə olunması prosesi qərb tədqiqatçıları arasında bir də ona görə sürətlə yayılıb elmi əhəmiyyət kəsb etmişdi ki, artıq bu zaman Kürdüstan coğrafiyasını, onun tarixini öyrənmək və kürd dilini tədqiq etmək şərqşünas alim və səyyahlarını maraqlandıran ən vacib və aktual bir məsələ olmuşdur¹⁰.

Elmin və siyasətin alimlər qarşısında qoyduğu bu tələb «Şərəfnamə»nin ayrıca bir tədqiqat obyektinə çevrilməsini və onun pərakəndə əlyazmalarının kitab halına salınması zəruriyyətini sürətləndirdi. Bu vəzifəni isə görkəmli rus şərqşünası V.Velyaminov-Zernov yerinə yetirdi. O, bu haqda yazır: «Mən kürd tarixinə aid elmin tutduğu mövqeyi nəzərə alaraq, «Şərəfnamə»nin nəşrini

zəruri hesab edib və bu işə başladım» (76, 20).

V.Velyaminov-Zernov «Şərəfnamə»ni fars dilində tərtib edib, elm üçün daha faydalı olan kitab halında tədqiqatçıların istifadəsinə verməkdən ötrü təxminən 30 il əmək sərf etmişdir. O, bu işlə məşğul olarkən, «Şərəfnamə»nin dörd əlyazmasından istifadə etmişdir. Lakin V.Velyaminov-Zernov qeyd edir ki: Bu dörd əlyazmalarından ən çox fayda verən M.Xanikovun əlyazması və Peterburq İmperator Akademiyasının Asiya muzeyindəki əlyazması olmuşdur» (76, 20).

V.Velyaminov-Zernov bu əlyazmaları bir-birilə müqayisə edərək düzgün nəticəyə gəlmiş və nəhayət, elmə olan xidmətini 1860-cı ildə müvəffəqiyyətlə başa çatdırmışdır¹¹.

V.Velyaminov-Zernovdan sonra Fransız Bernard Şarmua «Şərəfnamə»ni fransız dilinə hazırlamaq işi ilə məşğul olmuşdur. Lakin 1869-cu ildə o, ölmüşdür. «Şərəfnamə»nin fransız dilinə tərcüməsinin hər iki cildi 1875-ci ildə qurtarmış və Peterburq İmperator Akademiyası tərəfindən nəşr olunmuşdur.

Beləliklə, Kürdüstan tarixinin tədqiqi üçün ən faydalı bir mənbə olan «Şərəfnamə»nin tərtibə salınmasına ilk dəfə olaraq rus şərqşünasları təşəbbüs göstərmiş və bununla da kürd tarixşünaslığının sonrakı inkişafına şərait yaratmışlar. Buna görə də, müasir şərqşünasların əksəriyyəti kürd tarixindən bəhs edərkən, onun inkişaf dövrünün başlanmasını XIX əsrin II yarısından hesab edirlər. Bu haqda fikir söyləyən Yasəmi göstərir ki, «1863-cü ildən sonra kürdlər haqqında əlimizdə daha dəqiq məlumat vardır» (69, 102).

1897-1911-ci illərdə İranda olan fransız elmi heyətinin başçısı coğrafiyaşünas Jak Dümorqan, İran, Azərbaycan və Kürdüstan coğrafiyası haqqında 2 cildən ibarət cəzəl əsər yazmışdır. Müəllif həmin əsərini yazarkən Bidlisi «Şərəfnamə»sindən bir mənbə kimi istifadə etmişdir (71, 238).

1915-ci ildə Peterburqda şərqşünas alim V.F.Minorskinin kürd tarixinə aid yazdığı əsəri çap oldu. Müəllif həmin əsəri üzərində işləyərkən «Şərəfnamə»dən bir mənbə kimi istifadə etmiş və kürd tarixşünaslığında onun əhəmiyyətindən danışmışdır (22, 9).

Yenə həmin ildə Berlin Şərqşünaslıq Akademiyasının professoru Fric tərəfindən hazırlanmış «Kürdlər» adlı kitab nəşr oldu. Fricin bu əsəri «Şərəfnamə»nin izahı tərzində yazılmış və bəzi kürd qəbilə adlarının düzgün ifadəsi verilmişdir.

Müasir İran tarixçisi Əbdüleziz Cavahir Kəlam 1928-ci ildə nəşr etdirdiyi «Asar eş-imamiyyət»ə adlı kitabının çox yerində «Şərəfnamə»yə istinadən faktlar göstərmişdir (88, 205).


1930-cu ildə Şərq dilləri mütəxəssisi professor Seyid Məhəmmədəli Avni Qahirədə «Şərəfnamə»nin fars nəşrini çap etdirir. O, həmin əsərin hər bir səhifəsinə ətraflı izah vermişdir. Bu dövrdə «Şərəfnamə» əs-Seyyid Fərəculla Zəki əl-Kurdi tərəfindən ərəb dilinə tərcümə edilir. O, bu tərcüməni V.Velyaminov-Zernovun tərtib etdiyi mətn əsasında hazırlamış və müəllifin bir müqəddimə və geniş izahatla yazdığı bu əsərini «Kürd ensiklopediyası» (121, 2-3) adlandırmışdır. Həmin əsər sonralar bir çox müasir dillərə tərcümə edilərək, alimlərin və ədiblərin kürd tarixini öyrənməsi üçün əsas mənbə oldu.

1930-cu ildə müasir kürd müəllifi Bilec Şirküvenin Əl-qəziyyət-ül Kordiyətə adlı əsərində «Şərəfnamə»dən bir çox faktlar göstərilir (55, 6-9).

Müasir kürd tarixçisi Məhəmməd Əmin Zəki öz əsəri üzərində işləyərkən, «Şərəfnamə»dən tarixi bir mənbə kimi istifadə etmişdir.

Müasir İran tarixçisi Ələskər Şəmimi Həmədaninin 1932-ci ildə çapdan çıxan «Kürdüstan» adlı əsərinin bir çox hissəsində «Şərəfnamə»yə istinadən çoxlu faktlar vermişdir. O, həmin əsərində kürdlərin fars mənşəli olduqlarını isbat etməyə cəhd göstərmişdir¹². «İslam ensiklopediyası»nda İran və Kürdüstan tarixindən bəhs edilərkən, «Şərəfnamə»yə istinadən bir neçə fakt göstərilmişdir (132, 1206) ki, bu da tədqiqatçılar üçün çox faydalıdır.

1932-ci ildə A. Bukşpanın nəşr etdirdiyi əsərdə Sovet Azərbaycanında yaşayan kürdlər haqqında ilk məlumat «Şərəfnamə»yə istinadən verilmişdir. Qarabağ mahalında yaşayan bu kürd tayfaları «Şərəfnamə»də «iyirmi



dörd» lər adı ilə qeyd edilir (76, 32-39; 11, 57).

Məhəmməd Mərdox Kürdüstanı «Tarixə Mərdox» adlı əsərində «Şərəfnamə»dən çoxlu faktlar gətirmişdir.

Sovet kürdşünası Ə.Ş.Şamilov, 1936-cı ildə nəşr etdirdiyi əsərini yazarkən «Şərəfnamə»dən tarixi bir mənbə kimi istifadə etmişdir.

Sovet alimlərindən akademik Ə.Əlizadə XIII-XIV əsrlər Şirvan tarixindən və Şirvanşahlar dövlətindən bəhs edərkən, «Şərəfnamə»yə istinadən bir sıra faktlar göstərir (7; 5).

İ.P.Petruşevski Azərbaycan tarixinə aid elmi-tədqiqat işi ilə məşğul olarkən «Şərəfnamə»dən tarixi bir mənbə kimi istifadə edir. O, Bidlisinin qısa tərcümeyi halını qeyd etdikdən sonra, onun Azərbaycanda I Şah Təhmasib və II Şah İsmayıl zamanında müxtəlif vəzifələr daşdığını və buna görə də Azərbaycanı yaxşı öyrənə bildiyini göstərmişdir. O, təkcə XVI əsr hadisələri haqqında Azərbaycan tarixinə aid son dərəcə qiymətli məlumatlar verir (25, 304).

Beləliklə, Bidlisinin «Şərəfnamə»sini təkcə Kürdüstan tarixi üçün deyil, eyni zamanda Azərbaycan və İran tarixi üçün də faydalı bir mənbə hesab etmək olar.

Kürd müəlliflərindən Məhəmməd Əmir Zəkinin 1945-ci ildə nəşr etdirdiyi «Əd-düvəl və əl-İmaret əl-kürdiyyə Fi-l-əhd əl-İslam» (119) və 1947-ci ildə yazdığı «Məşaher əl-kürd və Kürdüstan Fi-l-əhd əl-İslam» (118), adlı əsərlərində «Şərəfnamə»dən bir çox faktlar gətirilmişdir. Həmin müəllif 1951-ci ildə çap etdiyi «Tarix əs-Sülyemaniyyə» (120) adlı əsərini yazarkən yenə də «Şərəfnamə»dən bir mənbə kimi istifadə etmişdir. Müasir kürd tarixçisi M.Cəmil 1953-cü ildə çap etdirdiyi «Əş-Şərəfnamə» əsərində «Şərəfnamə»nin geniş izahını vermişdir.

Şərqşünas alim V.F.Minorski 1953-cü ildə ingilis dilində nəşr etdirdiyi «Səfəvi dövlətinin idarə təşkilatı» əsərini yazarkən «Şərəfnamə»dən tarixi bir mənbə kimi istifadə edərək onu XVI əsrin dəyərli mənbələri sırasında göstərir (116, 71).

Müasir İran tarixçisi və milliyətçə kürd olan Rəşid Yasəmi 1952-ci ildə nəşr etdirdiyi «Kürd və onun əcdadının tarixi bağlılığı» əsərini yazarkən Kürdüstan tarixinə aid bir sıra faktları «Şərəfnamə»yə istinadən vermişdir. O, kürdlərin fars mənşəli olmalarını isbat etmək üçün «Şərəfnamə»dən istifadə edərək yazır: «Kürdlərin iranlı olması haqqındakı rəvayətlərdən biri də «Şərəfnamə»nin qeydiyyatıdır ki, İranın tarixi şəxsiyyətlərini kürd hesab edir» (69, 117). Yasəmi də Şəmimi Həmədani kimi kürdləri fars mənşəli göstərməklə, onların demokratik hüquqlar uğrunda mübarizələrini İranın ərazi bütövlüyü üçün zərərli hesab etmişdir və əsərini də elə bu münasibətlə yazmışdır¹³.

Ardı var

Kurdên Kafkasyayê hewl didin çand û zimanê xwe biparêzin

Hejmareke mezin ya Kurdên Kafkasyayê li Azerbaycanê dijîn. Ji ber şer û alozî û derfetên aboriyê jî, gelek Kurdên li Azerbaycanê li Bakuyê dijîn. Kurdên Bakuyê deriyên malên xwe ji tîma Kurdistan24'ê re vekirin û behsa serpêhatiyên xwe kirin. Kurdên Bakuyê hewl didin ku çand û zimanê xwe biparêzin. Ji Kurdên Bakuyê, Cemîla Wezîr a 85 salî behsa serpêhatiyêke xwe li gel Nemir Mele Mistefa Barzanî dike.

Di cîhanê de yek ji warên Kurdan jî Kafkasya ye. Hejmareke mezin a Kurdên ku li Kafkasyayê belavbûyî li Bakuyê dijîn. Yek ji wan jî rojnameger û nivîskar Tahir Silêman e ku rojnameyêke bi navê Diplomat amade dike. Ev rojnameya heftane, zêdetir behsa pêşhatên derbarê Kurdan de dike. Ji ber derfetên kêr ên abûriyê Tahir Silêman rojnameyê li mala xwe amade dike.

Nivîskar û rojnameger Tahir Silêman ji K24'ê re dibêje: "Ev 21 sal in ez vê rojnameyê çap dikim. Em vê rojnameyê bi kurdî, tirkî, ezerî û rûsî çap dikin û bi her çar zimanan dişînin Kurdistanê. Heta pandemiya jî me bazirganî dikir, rewşa me baş bû lêbelê niha rewşa me ya abûrî ne gelek baş e. Min beşeke mala xwe kiriye cihê amadekirina rojnameyê. Ez tenê vê rojnameyê amade dikim, ti kes alîkariya min nake."

Di salên 1950an de Nemir Mele Mistefa Barzanî bo demekê li Kafkasyayê dimîne. Cemîla Wezîr a wê demê 12 salî dibêje; wê Nemir Mele Mistefa li Taşkentê ditiye û bi hestiyarî behsa serpêhatiyêke xwe dike û tîne zimên; hesreta wê ew e ku di 85 saliya temenê xwe de serdana

Herêma Kurdistanê bike.

Cemîla Wezîr dibêje: "Demekê min dît derî vebû û kesek hate hundir, hemû kesên li hundir rabûn ser piyan. Min ji mamê xwe pirsî wî kir; mamê min got; ev Mele Mistefa



Barzanî ye, general e. Ez gelek keyfxweş bûme ku min Mele Mistefa Barzanî ditiye ku wî temenê xwe di oxira Kurdan de daye. Ez gelek serbilind im ku li kêleka wî rûniştim û min ligel axaftiyê. Rehma Xwedê lê be. Zarokên wî jî li wî çûne. Ez dixwazin Kurdistanê bibinim. Şabûna miletê xwe bibinim. Ez bibînim ku li Kurdistanê Iraqê hikûmeta Kurdistanê heye, mezinên me hene. Şikir ku kûrê Barzanî ye, babê wî miroveke gelek baş bû."

Hejmara Kurdên li Azerbaycanê nayê zanîn, lê belê tê gotin ku hejmara wan bi sedhezaran e. Ji ber bîşaftin û sedemên cûrbecûr di nava

piraniya Kurdên Azerbaycanê de kurdî hatibe jibîrkirin jî malbatên ku hewla parastina çand û zimanê xwe didin jî hene.

Xalidê Evdilbarî got: "Em eslê xwe ji Wanê hatine, lê belê bab û kalên

me ji Dohukê hatine. Ji beriya 200-300 salan i Duhokê derbasî Îranê bûne û ji Îranê derbasî Tirkîyeyê bûne û jê em derbasî Ermenîstanê bûne. Ev 80 sal in jî em hatine Azerbaycanê."

Marîna Îsayev jî dibêje: "Ez dikarim bi zimên kurdî, Îngîlîzî, rûsî, farsî, azerî û tirkî biaxivim. Em li vir bextewar in lê me dixwest ku em Kurdistanê jî bibinim." Kurdên Bakuyê di şîr û şahî ango di rojên xweş û nexweş de jî tîne cem hevdu û hewl didin ku çanda xwe, zimanê xwe biparêzin lêbelê hesreta dilê gelek ji wan ew e ku Herêma Kurdistanê jî bibinim.

Nerina Azad

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê peyamekî serxweşiyê belav kir

Duh 19.07.2024ê bi şev Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji ber koça



dawî ya parêzgarê berê yê Nînowa Dureyd Keşmûle peyamekî serxweşiyê belav kir.

Di peyama xwe de Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî ragehand: "Ji ber koça dawî ya parêzgarê berê yê Nînowa xwedê jê razî Dureyd Keşmûle serxweşiyê li malbata wî ya birêz dikim û şîrîkê xema wan im. Ji xwedayê mezin daxwaz dikim ruhê wî bi beheştê şad bike û sebr û aramiyê bide kesûkar û merivên û malbata wî."

36 sal di ser kîmyabarana 2 gundên Rojhilatê Kurdistanê re derbas dibin

Îro 36 sal di ser kîmyabarankirina gundên Zerde û Nasirdêrayê yên



parêzgeha Kirmaşanê ya Rojhilatê Kurdistanê re derbas dibin ku di şerê 8 salî yê Iraq û Îranê de, ji aliyê artêşa Iraqê ve bi çekên kîmyayî hatin bombekirin.

Îranê amaje bi raporeke komîsyona taybet a Neteweyên Yekgirtî ya derbarê şerê ji sala 1983 heta 1988an kir û ragihand, artêşa Iraqê 1800 ton gaza xerdel, 140 ton gaza Tabun û 600 ton gaza Sarîn bikar aniyê.

Li gorî raporta Neteweyên Yekbûyî, artêşa Iraqê di êrişên xwe yên li ser sînorê Îran û Rojhilatê Kurdistanê de, 19 hezar û 500 mûşek, 54 hezar top û 27 hezar mûşekên mamnavend bikar anîne.

Gundê Zerde li devera Rêjaw, li bilindahiyên bajarê Dalaho dikeve û 140 kîlometreyan li rojavayê bajarê Kirmaşanê dûr e. Xelkê gund ji sala 1988'an û vir ve ji ber bandora çekên kîmyewî, bi nexweşiyên cûrbecûr yên henase, korî û kerrbûn, hestiyariya çermî ketin. Bandor li ser birîndarên çekên kîmyewî ranewestiyane, belkû piştî karesatê ew nexweşî derbasî nîşên di piştê jî bûne. Sibeha roja Înê 22'ê Tîrmeha 1988'an, kêrî sê hefteyan beriya ragihandina agirbestê, artêşa Iraqê bi çend firokeyên şer gundê Zerde bombebaran kir, di encamê de 275 sivil hatin kuştin û bi sedan jî birîndar bûn. Di heman rojê de artêşa Iraqê bi çekên kîmyayî êrişî gundê Nasirdêrayê yê ser bi bajarê Gaylenxerbî yê Rojhilatê Kurdistanê kir, ku di encamê de 4 welatê şerhîd bûn û zêdetir 1000 welatîyên din jî birîndar bûn.

Civata Asayîşa Herêma Kurdistanê: PKK bi bername bizavê ji bo terorkirina welatîyan û endamên partiyên siyasî yên Herêma Kurdistanê dike



- Civata Asayîşa Herêma Kurdistanê radigehîne, "Koma têkder a PKKê ji ber bomba nûsandî erebeya berpirsekî bilind ê hizbî li baajrê Kelarê kir armanc."

Civata Asayîşa Herêma Kurdistanê duh roja Sêşem, ragehandinek parve kir û tê de hatiye, "Ev demek e koma têkder a PKKê bi awayekî bernamekirî bizavê ji bo terorkirina welatîyên Herêma Kurdistanê û kadir û endamên partiyên siyasî yên Herêma Kurdistanê dike, bi karên xwe yên şerxwazane zirarê digehînin ser û malên welatîyên Herêma Kurdistanê."

Civata Asayîşa Herêma Kurdistanê eşkere kiriye, "Di dawî kiriyara wê ya şerxwazane de li roja 15.07.2024ê bi rêya bomba nûsandî erebeya berpirsekî bilind ê hizbî li bajarê Kelarê kir armanc."

Di wê ragehandinê de hatiye, "Wê koma têkder di dema sê salên borî de gelek welatî û endamên hêzên bergiriyê

li Kurdistanê kirine armanc, ku hejmareke wan şehîd bûn û herwesa di hejmareke karên xwe yên têkderane de serkeftî nebûn û hatin pûçkirin û ew kom bi wê yekê jî ranewestiya, belkî bi şewitandina cihên giştî û sûk û molan li Herêma Kurdistanê û deverên din kîna xwe darêt û bû sedema gehandina zirarê ji bo kedkar û welatîyên xweşevî yên Herêma Kurdistanê." Herwesa tekez jî kiriye, "Ew kom bûye alavek ji bo bazirganîkirin û belavkirina madeyên hişber û karên neqanûnî li deverê û li ser astê navdewletî."

Herwesa amaje daye, "Ev zêdegaviya koma têkder a PKKê paşeroja deverê dixwe ber metirsiya herêmî û navdewletî û rengvedanên nerênî û nexwestî li dû xwe tîne, berde-wamkirina wan kiryanan bê bersivê nabe û serkirdetîya wê komê ji her encamp û rengvedanekê berpîrs e."

Tekista ragehandina Civata Asayîşa

Herêma Kurdistanê

Ev demek e koma têkder a PKKê bi awayekî bernamekirî bizavê ji bo terorkirina welatîyên Herêma Kurdistanê û kadir û endamên partiyên siyasî yên Herêma Kurdistanê dike, bi karên xwe yên şerxwazane zirarê digehînin ser û malên welatîyên Herêma Kurdistanê.

Di dawî kiriyara wê ya şerxwazane de li roja 15.07.2024ê bi rêya bomba nûsandî erebeya berpirsekî bilind ê hizbî li bajarê Kelarê kir armanc.

Wê koma têkder di dema sê salên borî de gelek welatî û endamên hêzên bergiriyê li Kurdistanê kirine armanc, ku hejmareke wan şehîd bûn û herwesa di hejmareke karên xwe yên têkderane de serkeftî nebûn û hatin pûçkirin.

Ew kom bi wê yekê jî ranewestiya, belkî bi şewitandina cihên giştî û sûk û molan li Herêma Kurdistanê û deverên din kîna xwe darêt û bû sedema gehandina zirarê ji bo kedkar û welatîyên xweşevî yên Herêma Kurdistanê.

Ew kom bûye alavek ji bo bazirganîkirin û belavkirina madeyên hişber û karên neqanûnî li deverê û li ser astê navdewletî.

Ev zêdegaviya koma têkder a PKKê paşeroja deverê dixwe ber metirsiya herêmî û navdewletî û rengvedanên nerênî û nexwestî li dû xwe tîne, berde-wamkirina wan kiryanan bê bersivê nabe û serkirdetîya wê komê ji her encamp û rengvedanekê berpîrs e.

Civata Asayîşa Herêma Kurdistanê 16ê Tîrmeha 2024ê

Nêçîrvan Barzanî û Îlham Elîyêv civînanan salek berê



Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokomarê Azerbaycanê Îlham Alîyev, di çarçoveya dan û stendinê dîplomatîk de li Bakuyê civiyan.

Di agahiyên ku li ser serdana Nêçîrvan Barzanî hatin ragihandin de hat diyarkirin ku Serokê Herêma Kurdistanê, li Balafirgeha Bakuyê ji aliyê rayedarên Dewleta Azerbaycanê ve hat pêşwazîkirin.

Li gorî hat zanîn, Nêçîrvan Barzanî piştî re civiya û li ser pêwendiyên dualî nîrxandin hatin kirin.

Di hevdîtina ku qala pêwendiyên di navbera Azerbaycan, Iraq û Herêma Kurdistanê de hat kirin de li ser bipêşxistina pêwendiyên û pêkvejiyana di warên cuda de tekezî kirin. Beriya niha jî di sibata borî de Nêçîrvan Barzanî tevî di Konferansa Ewlekariya Munchenê bûbû û di wê konferansê de jî ligel Alîyev civînek kiribû. **PeyamaKurd**

Helgurd Şêx Necîb: Şerê PKKê de vera me veguherandiye navendeke leşkerî

Serperîştyarê Îdareya Serbixwe ya Soranê Helgurd Şêx Necîb ragihand, şerê PKK û Tirkîyeyê



bandoreke xirab li ser jiyana welatîyên deverê kiriye.

Serperîştyarê Îdareya Serbixwe ya Soranê Helgurd Şêx Necîb îro ji ajansa K24ê re got: "Şerê PKK û Tirkîyeyê bandoreke neyînî li ser jiyana welatîyên deverê kiriye. Ji ber valabûna çend gundan jî, di warê îdarî de gelek pirsgrîkên me derketine."

Herwiha got: "Heya niha şerê PKK û Tirkîyeyê li sînorên Herêma Kurdistanê, ti bandoreke erênî û pêşçûn ji bo siyaseta PKKê li Bakurê Kurdistanê nekiriye." Tekez kir jî: "Qurbanîyên sereke yê şerê her du alîyan, xelkê deverê ne. Herwiha kêşe û aloziyên wan her du alîyan bûne barek li Hikûmeta Herêma Kurdistanê, di van salên dawî de jî hewlên mezin hatine dayîn ku ev kêşe ji deverên me bîndûrxistin."

Serperîştyarê Îdareya Serbixwe ya Soranê got: "PKKê, hêzên Tirkîyeyê kişandine sînorê Herêma Kurdistanê. Eger hêzên leşkerî li navçeyekê bi cîh bibin, ew navçe dibe navçeyekê leşkerî, lewma tevgera welatîyan dikeve metirsîyê."

Helgurd Şêx Necîb tekez kir, ew deverên ku hêzên PKKê lê ne, hêzên Tirkîyeyê hewl didin kontrol bikin, ku bi hatina wan jî dê bibe navçeyekê leşkerî. Deverên Biradost û Balekayetî ku deverên geştyarî, bazirganî û çandîniyê jî ne, ji ber şerê PKK û Tirkîyeyê, ziyaneke mezin gihîştîye wan."

94 sal derbas bûn, lê Kurd qet Simkoyê Şikak ji bîr nakin

93 sal beriya niha Simayîl Axayê Şikak ku weke "Simkoyê Şikak" an jî "Simîtko" tê nasîn, li bajarê Şinoyê yê Rojhilatê Kurdistanê bi biryara şahê wê demê yê Îranê Rîza Şah ve ji aliyê leşkerên wî welatî ve hat şehîdkirin. Lê bandora serhildana wî rêberê Kurd hêj jî li Rojhilatê Kurdistanê û bi taybet li herêma Urmiyê maye. Simayîl Axayê Şikakî di sala 1887ê li Urmiye ya Rojhilatê Kurdistanê ji dayik bûye. Kurê Mihemed Axayê serokê eşîra Şikak e. Piştî birayê wî Cewer Axa bi destê rejîma Îranê ya wê demê li bajarê Tewrêzê hat kuştin, Simko serokatiya eşîra Şikak wergirt.

Piştî ku sala 1905an, Cewer Axayê Şikak ku birayê Simko bû, li Tewrêzê hat kuştin, Simko soz da ku tola wî hilde û şerê li dijî hikûmeta wê demê ya Îranê berdewam bike.

Li gorî gelek çavkaniyên biyanî û Kurdistanî, tevî ku di destpêkê de hestê tohildanê li cem Simko hebûye, lê belê piştî derbasbûna demekê hizra wî ber bi tevgera netewî ve çûye. Li gorî wan çavkaniyan, şerê Simkoyê Şikak bi hikûmeta Îranê re şerekî netewî û ji bo bidestxistina mafên neteweyî yê milletê Kurd bûye.

Girîngiya serhildana Simkoyê Şikak ku nêzî 25 salan dom kir, ew e ku piştî şerê cîhanê yê yekem nêzî %50 ji axa Rojhilatê Kurdistanê ji destê desthilatdariya dewleta Îranê derxist û xiste bin kontrola xwe û rêveberiyek taybet ava kir. Herwiha piştî şoreşa Şêx Ubeydullahê Nehrî û Kela Dimdim, sores û serhildana Simkoyê Şikak, tevgera herî mezin a Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê bû. Hêza serbazî ya Simkoyê Şikak piranî ji çekdarên eşîreta Şikak pêk dihat, lê belê piştî ku eşîretên din ên Rojhilatê Kurdistanê piştigirî dan wî, wan eşîran jî çekdarên xwe tevî hêza Simko û Şikakan kirin.

Şikak li Rojhilatê Kurdistanê piştî eşîreta Kelhûr li herêma Kirmaşanê mezintirîn eşîreta vê perçeyê Kurdistanê ye ku di serdema desthilatdariya Qacarî û Pehlewîyan de li Îranê û Kurdistanê xwedî rolekî aktîv ê siyasî bûn. Navenda desthilatdarî û hêza Simkoyê Şikak û eşîreta Şikak bi giştî Kela Çariyê li navçeya Selmasê û herwiha bajarê Urmiyê bû.

Di dema herî bihêziya xwe de, her ji Mako û Kela Xwê (Xoy), Selmas, Urmiye, Mihabad, Şino û bajarokên din

ên parêzgeha Urmiyê heta sînorê Seqîz, Bane û Merîwanê li parêzgeha Sine di jêr desthilatdariya wî de bû û gefa kontrolkirina Sine û Kirmaşanê jî

bi aşkere behsa mafên netewî yê Kurdan, welatek bi navê Kurdistanê û serxwebûna Kurdistanê kiriye.

Kutschera herwiha ji ber xebatên



dixwar.

Rojnameya navdar a Amerîkî ya New York Times di raporekê xwe ya sala 1922ê de behsa şoreşa Simkoyê Şikak dike û dibêje, hikûmeta Kurdistanê hatiye damezrandin. Di rapore de tê gotin, ku Simko serkirdatiya hêzeke çekdar a 85000 kesî dike û sînorê hikûmeta wî jî Urmiye, Selmas, Kirmaşan û Erdelan e. New York Times herwiha dibêje, çavê Simko li Loristanê ye jî. Simkoyê Şikak di serdemekê de ku hêj civaka Îranê bi giştî û ya Rojhilatê Kurdistanê paşketî û feodalî bû û li ser bingeha rejîma axatiyê birêve diçû, gelek karên giring kirin, weke mînak li Kela Xwê bi alîkariya malbata Bedirxaniyan Medreseya Cîhanbanî vekir û di wê medreseyê de ji bilî fêrkirina zanistê bi zimanê Kurdî û Farsî, bi peryê hikûmeta xwe xwandekarên Kurd fêrî zimanên Fransî, Rûsî û Tirkî dihatin kirin. Herwiha yekemîn rojnameya Kurdî li Îranê û Rojhilatê Kurdistanê bi navê "Kurdistan" di serdema desthilatdariya Simko de li bajarê Urmiyê hatiye çapkirin û weşandin. Simko herwiha di navbera bajar û cihên stratejîk ên di bin desthilatdariya xwe de, cihên weke Mihabad, Urmiye, Selmas û Kela Çariyê xeta telegrafê kişand.

Weke ku nivîskar û dîrokanê Fransî, Chris Kutschera dibêje, Simko di çend nameyên xwe de ku bo çend berpîrsên Rûsî, Brîtanî şandine, gelek

wî yê di serdema xwe de, Simkoyê Şikak weke "bavê nasyonalîzma Kurdî" li Rojhilatê Kurdistanê bi nav dîke.

Simko di beşeke nameya xwe de ku ji bo fermanarê hêzên Îranê li bajarê Meraxê Zefer el Dulê şandiye, dibêje: "Em pir baş dizanin ku hinek netewe di cîhanê de hene ku hejmara wan nagihê çaryeka kurdan, lê ew gihîştine xweziyên xwe ku mafê otonomiyê ye. Li almanan binêrin ku çawa ev karê han di nava xwe de pêk anîne. Bi rastî ger netewa kurd di Îranê de negihîje mafê xwe, êdî mirin û neman jê re baştîre ji jiyana û mayîne. Di vê roja ku em tede dijîn, dewleta Îranê bixwaze an jî nexwaze, em mafê xwe yê otonomiyê dixwazin. Êdî ev xweziya hemû mirovekî Kurd e û ji xelkê me re jî jiyaneke nû ye.

Ev name dide diyarkirin ku Simko mirovekî durbîn bûye û ji bo standina mafê rewa yê gelê Kurd bi armancên mezin û planên nû dest bi xebata xwe ya siyasî kiriye.

Simkoyê Şikak di 25 salên serhildana xwe de, rastî gelek serkevtin û şikestan jî hat, herî dawî piştî ku hikûmeta Îranê karî serhildana wî tekîbibe, Simko derbasî aliyê Başûrê Kurdistanê bûbû û piştî demekê li ser banga Îranê ya ji bo muzakere û danûstandinan, di 21ê Tîrmeha 1930an de çûbû Şinoyê û li wir bi pîlana Rîza Şah ji aliyê hêzên Îranê ve hat şehîdkirin.

Amerîka: Em piştigiriya asayîkirina pêwendiyên Sûriye û Tirkîyeyê nakin


Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê ragihand ku ew piştigiriya hewlên asayîkirina pêwendiyên Sûriye û Tirkîyeyê nakin.

Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê derbarê hewlên asayîkirina pêwendiyên Tirkîye û Sûriyeyê, bersiva çend pîrsên Nûçegihanê Rûdawê Diyar Kurde da. Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê ji Rûdawê re got:

"Em piştigiriyê nadin wê hewlê û heta rejîma Sûriyeyê ji bo çareseriyê aloziya 13 salan pêngavên cidî navêje.

Em ti carî pêwendiyên xwe bi Şamê re asayî nakin.

Amerîka piştigiriya wan hewlan nake. Me ji Tirkîyeyê xwestiye ku van hewlan ji bo pêkanîna armancên biryara 2254 ya Encûmena Asayîşa Navdewletî ya derbarê aloziya Sûriyeyê bi kar bîne.



Heta ku pêşketineke rasteqîn ji bo çareseriyê siyasî ji aloziyê re çê nebe em pêwendiyên xwe bi rejîma Esed re asayî nakin.

Me ji welatên pêwendiyên wan bi rejîma Sûriyeyê re hene xwestiye, pêwendiyên ji bo başkirina rewşa mirovî, mafên mirovan û rewşa ewlehiya Sûriyeyê û bidestxistina armancên projebiriyê Neteweyên Yekbûyî bîne bi

kar bînin."

Tirkîye beşekî axa Sûriyeyê bi leşkerên xwe dagir kiriye.

Şertê ewil a Şamê derxistina leşkerên Tirkîyeyê ye.

Li gorî pisporan, Enqere ji bo pêşî li statuya Rojavayê Kurdistanê bigire xwe nêzîkî Şamê dike.

Piraniya civaka Tirkîyeyê ji bo vegevandina penaberan dixwaze her du serok hevdîtinan bikin.

Serpêhatiya rêberê efsaneyî Simkoyê Şikak



çarçoveyê de dibistaneke kurdî li bajarê Xoyê (bajarê Xwê) tê vekirin ku çend mamosteyên Kurd ku ji Qefqazê hatibûn, bi zimanê Kurdî û Rûsî, ders dane 29-30 zarokên Kurd.

Li dawiya sala 1914an di kelekela şerê yekem ê cîhanî de, li gor lihevkerina di navbera Rûs û Îraniyan de, di dema dîrxistina Simko ji aliyê Rûsan ve bo Tiflîsê, li nêzî Colfayê ji aliyê Ermeniyên ve teqe lê hate kirin, lê ti zirarek negihîştê.

Di sala 1916'an de, dema ku rûsiyan dîtin ku bêy hebûna Simko li herêma Xoy û Kotolê, metirsiya dagîrkirina wan herêman ji aliyê Osmaniyan ve heye, Simko serbest berdidin û rê didin ku vegere devera Kotolê.

Sala 1918'an li ser daxwaza Marşîmon rêberê olî ê Asûriyan, Simkoyê Şikak bo hevdişînê ji Çariyê diçe

Kohneşehr a nêzî Selmasê. Di vê hevdişînê de, dema ku Simko pê dihesa ku Marşîmon li gor qewlên ku berê Rûsan dabûne wî û gelek çek û teqemenî dabûnê, dixwaze dewleteke Asûrî li ser xaka Kurdistanê ava bike, lewra bo pûçkirina wê pîlanê di pêvajoya vê hevdişînê de Marşîmon dike.

Di nameyekê de ku tê texmînkirin di sala 1919an de Simko bo generalê desthilatdar ê Îranî Hesên Muqedemê Zefer El-dewle nivîsiye, di wê nameyê de Simko gotiye wî karbidestî, di cîhanê de gelek neteweyên kêmtir ji Kurdan bûne xwediya dewleta xwe. Ger Kurd bi vê nifûsa xwe nekarin otonomiya xwe bi dest bînin, mirina wan baştir e ji hebûna wan.

Di meha duyem a bihara 1919'an de, hakimê Tewrêzê Mukerem El-mulk, bi alîkariya Ermeniyên wir, paketeke



Mihemedsalih Qadirî

Simko sala 1887'an ji dayîk dibe. Piştî wê ku di sala 1905an de Cewher axayê birayê mezin ê wî ji aliyê hakimê Tewrêzê ve bi xapandinê tê kuştin û piştî wê ku Mihemed Axayê bavê wî ji aliyê Osmaniyan ve tê bêsêrûşûnkirin, ew jî ji sala 1906'an ve li herêmên Kotol, Makû, Kela Xwê (Xoy), û Selmasê, bona bihêzkirina desthilata xwe dest bi liv û tevgerê dike.

Li meha îlona sala 1912'an dema ku Ebdulrezaq Bedirxan û Seyîd Taha neviyê Şêx Ubeydullah ji Tiflîsê diçin Xoyê, li wir ji aliyê çekdarên Tirk ve têne girtin û ber bi aliyê Tirkîyê ve têne birin, Lê Simko dema pê dihesa, bi hêzekê êrişî ser wan dike û li ser sînorê di navbera Îran û Tirkîyê piştî şerekî kurt Ebdulrezaq û Seyîd Taha ji destê wan rizgar dike.

Di despêka sala 1913'an de Simkoyê Şikak bi hevkarîya Ebdulrezaq Bedirxan karî "Komeleya Cîhandanî" li bajarê Xoyê ava bike. Di vê



bombekirî amade dike û li ser navê şandina diyariyekê ji aliyê jineke Azerî ya xizma Simko ve bo Xusroyê kurê Simko, bombeyê bo kuştina Simko dişîne Çariyê. Di encama teqîna bombeyê de, birayê Simko bi navê Elîxan û sê kesên din di cih de têne kuştin û çend kesên din jî birîndar dibin.

Lewra Simko roja 17.07.1920'î Emerxanê Şikak mişêvr û fermandeyê giştî yê hêzên çekdar ên xwe erkdar dike ku êrişî ser hêzên dijmin bike, û Emerxan jî piştî şerekî giran kariye bendera Golmexane û cihên stratejîk ên Urmiyê bigre û bi vî rengî bajarê Urmiyê ji destê neyaran rizgar bike.

Şerê rizgarkirina Mehabadê

Sala 1921'an hêzên Simko piştî şerekî giran zêdetir ji 700 kes ji hêzên Îranê kuştin û herwisa fermandeyê giştî yê serbazên Îranê li padigana Mihabadê bi navê Hesên Melekzade jî bi dîl girtin û bajarê Mihabadê bi yekcarî ji destê dagîrkerên Îranî rizgar kirin.

Şerê Şekeryazê

Roja 17.12.1921'an artêşa Îranê bi 5 hezar şerkeran ve û bi fermandehiya Emîr Erşed Zirxam Qeredaxî li gel şevirmendê leşkerî yê Swêdî bi navê "Lindbergh" êrişî ser Simko kirin. Emîr Erşed Zirxam Qeredaxî birayê Mihemed Husênxan bû, ku wî di sala 1905'an de, Cewher Axayê birayê Simko li Tewrêzê kuştibû. Di çarçoveya fermana Simko de Emerxanê Şikak jî bi hêzeke teyar, digel 200 şervanên Zêbariyan çeperên dijmin dişkînin û Emîr Erşed Qeredaxî jî dikujin.

Di Tîrmeha 1922'an de Simko rojnameya "Kurd" li bajarê Urmiyê daye weşandin, ku çend hejmarên wê bi du zimanên Kurdî û Farsî hatin weşandin.

Simko di dema serhildana xwe de têkiliyeke berfireh li gel piraniya serokhoz û rewşenbîr û şoreşgerên Kurdan hebûye û di nameyêke xwe de



Serpêhatiya rêberê efsaneyî Simkoyê Şikak



rû li gelê Kurd dike û wiha dibêje:

“Ey Kurdino! Xeynî yekîfî û pêkvebûnê, me ti riyek bona rizgariya

navê Xusro jî tê girtin.

Roja 06.11.1922`an çend karbidestên Îngilîzan bi serperestiya “Sidi Edmunds” li gundê Behirkê ya ser bi Hewlêrê bi Simko û Seyîd Taha û Ehmed Axayê birayê wî re dicivin. Di vê civînê de serbarê hewla Simko bo rakêşana piştgiyariya Îngilîzan, lê karbidestên Îngilîzê ti qewleke piştgiyariyê nadin tevgera Simko.

Roja 08.01.1923`an Simko ji bo seredana Şêx Mehmûd çûye bajarê Silêmaniyê û li wir bi merasimeke fermî û di nav kernevaleke mezin de ji aliyê Şêx Mehmûd û xelkê Silêmaniyê ve hatiye pêşwazîkirin.

Simko li heyama mana xwe ya li Silêmaniyê, piştî çendîn hevdiînan li gel Şêx Mehmûd çî bersivê erênî bo dûrketina wî ji Tirkan û lihevkerina bi Îngilîzan re jê wernegirtiye. Herwisa Simko çî hêviyek bi piştevaniya Îngilîzan jî nemaye ku di wê demê de, li dijî Îranê piştevaniyê li Simko bikin. Di wî çaxî de bi sedema ji nû ve

destpêkirina şerê di navbera Şêx Mehmûd û Îngilîzan, êdî Simko tê gihîştîye ku mana wî li Silêmaniyê bêfeyde ye û pêşeroja wî jî ne zelal e. Lewma di 28.03.1923`an de ji bajarê Silêmaniyê derdikeve û vedigere derdora Rewanduzê.

Piştî bêhêvîbûna Simko ji Îngilîzan û bicihêlana Silêmaniyê û hatina wî bo herêma Rewanduzê, li wir ji aliyê Ozdemir karbidestê Tirkîyê ve hinek qewl û soz bi Simko têne dayîn. Hikûmeta nû ya Tirkan bona ku nehêle Îngilîz Simko li dijî wan bi kar bînin, wekî taktîka demkî, li gel rêdana bi Simko bo çûna nav Tirkîyê û radestkirina beşek ji darayî û malê zewtkirî yê wî û herwisa berdana Xusroyê kurê wî, gelek qewlên din jî dane Simko.

Lê piştî wê ku peymanê Lozanê li rêkvevt 24.07.1923`an tê îmzekirin û nakokiyên di navbera Tirkan û

Îngilîzan li ser qedera Mûsilê, heta qasekê yekalî bûye, êdî Simko nekariye di Tirkîyê de bimîne û carek din bi destê betal vegeyriyê ser sînor û li derdora Çiyayê Dalamper li ser sînorê di navbera Îran, Tirkîyê û Iraqê de akincî bûye.

Di destpêka sala 1924`an de piştî lihevkerina di navbera Simko û hikûmeta Îranê de, Simko vedigere Îranê û li gundê Howesnê ya girêdayî herêma Soma ya Urmiyê cihûwar dibe.

Sala 1925`an di dema pêşwaziya Simko ji hatina Rizaxan bo Selmasê, dema ku Rizaxan çekdarên Simko dibîne, ditirse û hizir dike ku ketiye dava Simko de û bi armanca xwederbazkirinê zû xatirê xwe jê dixwaze û dibêje ez ê saet 4ê êvarê herim Kohneşehrê û tu jî were wir bona ku em bi hev re biaxifin. Simko piştî xatirxwastina wî bi diltengiyê mezin û bi dengê bilind gotiye:

“Diviya min ew kuştiba. Ji niha şûnda çî bête serê min heqê min e. Bêguman dê rojek bêt ku heman Rizo



Simko in Sulaimani

Unknown/Courtesy: Rafiq Shabir

bête Şinoyê û li wir çavê wî bikeve serleşker Hesên Muqedem fermanê payebilind ê Îranî.

Simko ku bi niyetpakî dixwast digel karbidestên Îranê bo çareserîya kêşeyên di navbera xwe de gotûbêjê



neteweya xwe ji destê dijmin pê şik nayê û ji bilî girtina destê biratiya hevdu, ti çareyek bo rewşa bêçaretiya Kurdan tineye. Bi rastgoyî, destê yekgirtin û pêkvebûnê bidin hevdu û bi hemû hêz û şiyana xwe li hember destdirêjiya dijmin xwe biparêzin. Rêya rizgariyê tenê ev e, ne ti tiştêke din”.

Roja 27.07.1922`an di bin fermandehiya serleşker Cehanbanî de, 15 hezar leşkerên hikûmeta Rizaxan êrişî ser Kela Çariyê êvirgeha Simko dikin. Di rewşeke wisa de Simko neçar maye ku ji Kela Çariyê ve ber bi herêma Şipîranê ya nêzîkî sînorê Tirkîyê paşve kêşanê bike.

Di şeveke Oktobera 1922`an de, hêzên Tirk êrişî ser gundê Şamanis a Bakûrê Kurdistanê dikin. Di encama vê hêrişê de hevjiîna Simko ya bi navê Cewahir Xanim tevî çend kesên din têne kuştin û kurê Simko yê şeş salî bi



(Rizaxan) dê min bikuje”.

Sala 1926`an Simko bi 1500 kesî êrişî ser Selmasê kir, lê bi sedema nakokiyên navxweyî nekarî bajar bigre û di dema paşvekêşanê de li herêma Soma-Biradostê hate têkşikandin û neçar ma ku here Iraqê û li bakûrê Rewanduzê li Sîdekan biêvire.

Sala 1928`an cardin Simko li gel Tirkan li hev kir û li gel alfgirên xwe çûne nav sînorê Tirkîyê û li herêma Gewer a Bakûrê Kurdistanê bicih bûn.

Piştî vê ku Simko bo heyama du salan di rewşeke dijwar de, li sêgoşeya Başûr û Bakûr û Rojhilatê Kurdistanê dimîne, li havîna sala 1930`î serheng Sadiqxanê Newrozî ji rêya Teymûrê Şikak ve ku pêştir çekdarê Simko bûye, nameyekê ji Simko re dişîne û daxwazê dike ku Simko

bike, lê karbidestên hikûmeta Îranê berevajî dixwastin wî bixin davê û ji nav bibin. Mixabin Simko bi vê pîlana wan a qirêj nehesiya û bi hêsanî kete dava neyarên xwe de û roja 18.07.1930`î (27.04.1309an) li bajarê Şinoyê hate terorkirin. Bi vî rengî canê wî qehremanê efsaneyî yê Kurdistanê dibe goriyê nîştîman û dawî li tevgera wî ya zêdetir ji 20 salan tê.

Rizaşah hizir dikir ku bi nemana Simko xebat û tekoşîna Kurdan li Îranê dê bo heta heta bi dawî bê, lê li sala 1941an di dema şerê duyem ê cihanî de eva Rizaşah bû ku dawî li hikûmeta wî hat û careke din gelê Kurd rabû ser piyan û vê carê bi rêberîya Pêşewa Qazîmihemed li sala 1946`an karîf Komara Kurdistanê ava bikin.

Mohra taybet a Simkoyê Şikak

Nêçîrvan Barzanî ji bo Azerbeycanê hat vexwendin

Serokê Herêma Kurdistanê Herêma Kurdistanê, Serokê Nêçîrvan Barzanî ji bo beşdarbûna Dîwana Serokatiya Herêma Kurdis-



Konferansa Guherîna Keşewayê ya Neteweyên Yekgirtî li Bakuyê, Paytexta Azerbeycanê, hat vexwendin.

Li gorî daxuyaniya Serokatiya

tanê Fewzî Herîrî îro 22ê Tîrmehê pêşwazî li Balyozê Azerbeycanê li Iraqê Nasir Memmedov kir.

Di hevdîtîna de, Balyozê Azerbeycanê vexwandina fermî ya

Serokê welatê xwe bo Nêçîrvan Barzanî, gihan Serokê Dîwana Serokatiya Kurdistanê, ji bo beşdarî Konferansa Guherîna Keşewayê ya Neteweyên Yekgirtî (COP29) bibe ku di 11 ta 22 Mijdara îsal de li Bakuyê dê lidar bikeve. Her du aliyên pêşdebirina peywendiyên di navbera Azerbeycan û Iraq û Herêma Kurdistanê de, rewşa Iraq û Herêma Kurdistanê û pêşhatên navçeyê bi giştî gotûbêj kirin. Balyozê Azerbeycanê daxwaza welatê xwe ji bo berfirekirina peywendiyên ligel Herêma Kurdistanê nîşan da û tekezî li ser wê yekê kir ku serdana Nêçîrvan Barzanî bo Bakuyê û hevdîtîna wî ligel Serokomarê Azerbeycanê Îlham Eliyev, rûpelek nû di peywendiyên welatê xwe ligel Iraq û Herêma Kurdistanê vekir.

Senatorê Fransî serlêdan kir: Ez Dixwazim bi Abdullah Ocalan re hevdîtîna bikim

Senatorê Fransî Pascal Savoldelli bal kişand ser tecrîda li Îmraliyê

wê rojê ve li Girtîgeha bi Ewlekariya Bilind a Îmraliyê tê



û ji bo ku hevdîtîna bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re bike, serî li Wezareta Edaletê ya Tirk da.

Li gorî nûçeya Mezopotamya Ajansi (MA), Senatorê Partiya Komunist a Komara Fransayê Pascal Savoldelli ji bo hevdîtîna bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re ji Wezareta Dadê re name şand. Savoldelli, di nameya xwe de bal kişand ser peymanên navneteweyî û xwest di vê mijarê de destûrên fermî bîn dayîn.

Nameya Savoldelli ji wezarete re şandî wiha ye: "Ji bo bala we bikişînim ser rewşa Abdullah Ocalan ku ev 25 sal in li Tirkîyeyê girtî ye, weke Senatorê Komara Fransayê ji we re dinivîsim. Weke ku hûn jî dizanin, Abdullah Ocalan di sala 1999'an de hate girtin û ji

ragirtin. Raporên saziyên parastvanên mafên mirovan dibêjin ku di mijara mafên serdan û têkilîdanîna yên Ocalan de astengkirinên cidî hene û gelek caran gotin ku ev rewş tê binpêkirina mafên girtiyan ên navneteweyî. Di tevahiya van salan de şert û mercên girtîgehê gelek caran pir hişk hatine pênasîkirin û tecrîdên domdirêj çêbûne. Abdullah Ocalan, di muzakereyên aştiyê yên di navbera hikûmeta tirk û kurdan de bûye aktoreke sereke.

Di dema hevdîtîna aştiyê yên ji sala 2013'an ve de Ocalan bi rola navbeynkariyê rabû, banga agirbestê kir û xwest dijminatî were bidawîkirin. Dîsa jî parêzer û malbata wî 5 salan agahî ji Abdullah Ocalan negirtibûn, di adara 2021'ê

de li ser telefonê bi endamekî malbata xwe re hevdîtîna kir. Ev hevdîtîna 4 deqeyan domiya û axaftin hate qutkirin. Ev rewş, têkildarî mafên bingehîn ên Ocalan, bi taybet jî di mijara mafê pêwendîdanîna bi xizm û varîsê qanûnî re fikarên mezin çêdike. Bi navê hiqûqa navneteweyî, ez bi taybet jî di çarçoveya Peymana Têkildarî Mafên Medenî û Siyasî ya Navneteweyî (MŞHÎS) û Qeydên Nelson Mandela de derheqê rewşa tenduristî û mercên girtîmayîna yên Abdullah Ocalan de agahiyan dixwaz dikim. Rêzgirtina ji bo mafên mirovan, mafên serdan û pêwendîdanîna bi cîhana derve jî di nav de, rêgezeke sereke ya peymanên navneteweyî ye ku Komara Tirkîyeyê jî aliyekê wê ye.

'DIXWAZIM SERDANÊ BIKIM'

Di heman demê de weke parlamenterek, dixwazim bi Abdullah Ocalan re di mercên ku parêzerên wî jî li wir bin pê re hevdîtîna bikim. Ev hewldan, li gorî nîrx û temînatên Peymana Mafên Mirovan e ku Konseya Ewropayê û Tirkîyeyê jî îmze kirî ye û di çarçoveya erka min a çavdêrî û teşwîqê de ye. Ez dixwazim ji bo hevdîtîna bi Abdullah Ocalan re destûrên pêwîst bîn dayîn. Ji her niha ve ez ji bo eleqedarbûna we ya ji bo vê daxwaza min spas dikim û bi hêviya ku di demeke herî kin de hûn bersiveke erênî bidin min."

Amerîkayê çekên nû derbasî Rojavayê Kurdistanê kirin



Hêzên Hevpeymanîya Navdewletî ya li Dijî DAIŞê, karwaneke ji 25 barhilgirên çek û kelûpelên nû pêk dihat, bir baregeha xwe ya leşkerî ya li bajarê Heseke.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragihand ku Hêzên Hevpeymanîya Navdewletî ya li Dijî DAIŞê çek

û teqemenî û pêdawîstiyên lojestîk bi 25 barhilgiran, gihandin baregeha xwe li parêzgeha Heseke ya Rojavayê Kurdistanê.

Di nav wî karwanê de, tankerên sûtemeniyê û sindoqên girtî û madeyên lojestîk bi rêya Deriyê Sînor ê El-Welîdê ji aliyê Herêma Kurdistanê, derbasî Cizîra Rojavayê Kurdistanê bû.

Êvara Înê jî, Hêzên Hevpeymanîya Navdewletî balefireke bar ji pêdawîstiyên lojestîk, leşkerî û çek û teqemenîyan gihande baregeha Xerab el-Ebidê ya Rimêlanê.

Berî bi hefteyekê jî karwaneke ku ji 40 barhilgiran pêk dihat, gihiştibû baregeha leşkerî ya navçeya Şedadiyê ya Heseke.

Di nav karwanê de wesayîten bizirx ên tîpa "Bradley"ê jî hebûn ku leşkerên Amerîkayê tê de bûn.

Mezlûm Ebdî: Pêkan e li Tebaxa bê danûstandinên Kurdî - Kurdî bîn vegerandin

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mezlûm Ebdî dibêje,



"Pêkan e li dawîya meha Tebaxê ya bê danûstandinên Kurdî - Kurdî bîn vegerandin."

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mezlûm Ebdî îro di hevpeyvnêkê de bi kanaleke televîzyonî re ragehand, "Niha daxwaza vegerandina danûstandinên ji me û Amerîka û Brîtanya û Fransayê tê kirin."

Navbirî di derheqê hilbijartinan de jî got, "Çi kesekî maf nîne daxwaza paşxistina hilbijartinan ji me bike, lê li ser me pêdivî ye em hizir di berjewendiya gelê xwe de bikin."

Di derheqê asayîkirina peywendiyên Sûriye û Tirkîyeyê de jî amaje da, "Ez bawer nakim bizavên rêxweşkirinê di navbera Enqere û Dîmeşqê de bigehin encamekî destnîşankirî, her çî nebe di paşerojê nêzîk de, ji ber ku doza Sûriyeyê gelek aloz e."

Herwesa li ser doza Kurdî li Sûriyeyê jî got, "Doza Kurdî li Sûriyeyê gelek mezin e û rijem heta niha du dersên Kurdîyê jî qebûl nake." Herwesa got, "Em ji bo danûstandinên bi Tirkîyeyê re amade ne lê şertê me yê serekî gengeşekirina li ser xwevekeşana Tirkîyeyê ji deverên me yên dagirkirî ye, û helbet wan jî şertên xwe hene."

Li Bexdayê xwepêşandan ji bo guhertina sistema pîvanên dayîna mûçeyan dest pê kirin

Bi sedan fermanberên wezareta û saziyên hikûmeta Iraqê îro 20ê Tîrmehê li pêş Navçeya Kesk a li Bexdayê xwe pêşan dan û daxwaza



guhertina sistema pîvanên dayîna mûçeyan kirin.

Bi sedan fermanberên wezareta û saziyên hikûmeta Iraqê îro 20ê Tîrmehê li pêş Navçeya Kesk a li Bexdayê xwe pêşan dan û daxwaza guhertina sistema pîvanên dayîna mûçeyan kirin. Yek ji xwepêşandan yê bi navê Wîsam Ehmed ku fermanber e ji medyaya Iraqê re ragehand: "Em daxwazê ji hikûmet û nedadperweriya di mûçe de heye, çareser bikin û cudahiyan zêde yên çînî di navbera fermanberan de kêmkirin."

Herwiha got: "Newekhevî û nedadperwerî zêde di mûçeyên fermanberan de heye. Fermanberê encûmena wezîran û parlamentoyê û serokatiya komar ango li hersê serokatiyên Iraqê de, mehaneya wan 3 milyon dînar e û bi heman paye fermanberên li wezaretan û fermangehên din tenê 500 hezar dînar mûçe werdigrin."

